

ç e n d g o t i n

Çirokên bi Ermenîkî yên di vê kitêbê de,
ji kitêba nivîskêr ya bi navê Mer Ayt Goğmerî (1984, Marmara)
hatine wergirtin. Tîrkiya van çirokan, cara pêşî di 1992an
de bi navê Gâvur Mahallesi (Bebekus'un Kitaplığı)
û Kurdiya wan jî di 1999an de bi navê
Li Ba Me Li Wan Deran (Avesta) hatin weşandin.

Spasî ji bo weşanên Avesta Nota weşanger.

TAXA FILLA

(LI BA ME LI WAN DERAN)

Aras Yayıncılık
İstiklal Caddesi, Hıdivyal Palas 231/Z
34430 Tünel, Beyoğlu-İstanbul
Tel: (0212) 252 65 18 - 243 06 02
Fax: (0212) 252 65 19
info@arasyayincilik.com
www.arasyayincilik.com
Sertifika No: 10728

ARAS - UUUU 220

Taxa Filla
Migirdiç Margosyan
Gâvur Mahallesi

Werger
Rûken Bağdu

Redaksiyon
Goran Haco

Dizayna Bergê
Melisa Arsenyan

© Migirdiç Margosyan, 2018
© Aras Yayıncılık, 2018

ISBN 9786052100301

Çap
Sena Ofset, 2. Matbaacılar Sitesi 4NB7-9-11 Topkapı-İstanbul
Tel: (0212) 613 38 46 / Sertifika No: 12064

Cotmeh 2018, Stembol


TAXA FILLA

(LI BA ME LI WAN DERAN)

MIGIRDÎÇ MARGOSYAN

WERGERA JI TIRKÎ
RÛKEN BAĞDU





MIGIRDÎÇ MARGOSYAN

MIGIRDÎÇ MARGOSYAN

Di 1938an de li Diyarbêkrê, li taxa Xançepekê (Taxa Filla) hatiye dinyayê. Perwerdahiya xwe ya seretayî li Dibistana Süleyman Nazif kir. Li Lîseyaya Ziya Gökalp dest bi xwendina navîn kir û li Stembolê li dibistana Bezciyan ew xelas kir. Li Stembolê Lîseyaya Getronagan xwend. Li Unîversîteya Stembolê beşê Wêje û Felsefeyê xwend. Di salên 1966 û 1972an de li Lîseyaya Ermeniyana Surp Haç Tıbrevank, serpereştî kir û li aliyekî jî mamostetiya dersên felsefê û psîkolojî û ziman û wêjeyaya Ermenîkî kir. Çîrokên wî yê Ermenîkî di rojnameya Marmarayê de hatin weşandin. Di rojnameyên *Agos*, *Yeni Yüzyıl*, *Yeni Gündem* û hin kovaran de bi Tirkî nivîsî. Hê jî di rojnameya Evrenselê de di kuncikê xwe yê bi navê “Kırveme Mektuplar” de dinivîse.

Kitêbên wî:

Mer Ayt Goğmeri, Dikrisi Aperen, Gâvur Mahallesi, Söyle Margos Nerelisen, Biletimiz İstanbul'a Kesildi, Tespih Taneleri, Kırveme Mektuplar, Zurna, Çengelliğne, Kürdan, Tanrı'nın Seyir Defteri, Fillaname.

Min di nivîsên xwe de qala ba me, wan deran kir.
Çawa min dît û jiyam, weke xwe. Hema bêje min dest
neda tîp û navên kesan, bêguhêrîn weke xwe hiştin.
Gelek ji wan kesan; ji wan xwişkan, ji wan xalan,
ji wan apan, ji mêj ve derbasî dinya wî alî bûne.
Hinek be jî bila navê wan, bîranînên wan di nav van
rêzikan de, di vê kitêbê de bijîn.

Taxa Filla

Rojeke zivistanê bû. Berfê rûwê hemû kuçên teng ên Diyarbekrê vegirtibû û ew xistibûn bin hukmê xwe. Berf wek riya Sarkîsê Dilovan, fiq spî li seranserê rê dirêj dibû. Ji hewşa dêrê bi pêpelûkên derencê ve hildikişiya diçû ser dîwarê ku zengilê dêrê li ser bû û xaça pîroz a li hafa bajêr dida hembêza xwe maç dikir.

Ûso, zengilvanê dêrê bû. Jê re digotin Ûsoyê dînik jî. Jixwe divê gava mirov behsa wî bike jê re bêje yekî “kêmaqil” rasttir e. Berî ku Ûso li dêrê bibe zengilvan, li ba birayê xwe yê bi salan jê mezintir, Sebroyê Hesinger nixafê dikişand. Ûso bi wê kêmaqiliya xwe carna dikir ku şîreta li Sebro –bi navekî din Kûpê Hêrsê– bike. Lê hingê jî hema nedima ku qiyamet ranebûwa. Wisa bi devê hevdigirtin ku êdî biratî li aliyekî dima, şer dibû şerê hoste û şagirtan. Heta ku cîran dihatin hawara wan û bêyî ku xwîn birije ew li hev dihanîn. Ûso wê bi hêrs pêşmalka xwe deraniya û bivirviranda bi aliyê birayê xwe ve bigota “Heke careke dîn piyê min bi vir ket bila ez kurê te bim!..” Piştî komek çêr û

pêçarî weke hercar wê rasterast berê xwe bidaya alî dikana birayê xwe yê din cêwiyê Sebro, Rizgo bêpirs û bersiv wê biketa ber nixafê.

Hemû kes hînî çûnûhatina Êso ya di navbera Sebro û Rizgo de bûbûn... Kes berbayî wan pevçûnan nediket. Sebro û Rizgo herdû ji mêj ve zewicîbûn, bûbûn xwedî mal û kar. Ji gava ku bavê wan miribû Êso û diya xwe Xwişka Rihanê herdû bi tenê ji xwe re li menzeleke di hewşa dêrê de diman. Piştî ku Zangoç Zifkar çû ser dilo-vaniya xwe, rêvebirîya dêrê bi biryarekê Êso anî ser karê Zengilvaniya dêrê. Cemaeta Ermeniyaniyan bi vê biryarê pîrr kêfxweş bû lewre digotin bi vî awayî “bi kevirekî du çivîk hatin xwarê”. Ji xwe re digotin bi vî şiklî be emê him ji pevçûna navbera herdu bira, dibe ku rojekê bi xwînê, bi kêrê, bi dasê, an jî bi zompê bi dawî bibûya û dê bi vî awayî şagirtîya hesinkerî ya Êso di çil saliya wî de tamam bibûya, xelas bibin him jî lê ne lê ji zengillêdana Êso xelas bibin... Li aliyê din jî bela ku divabû tim û dayîm li dêrê li ser karê xwe bimaya, ew ên ku carna li kolanan didane dût wî û henekên xwe pê dikirin wê ji vê kêfê û ji çêrên wî yên ku li tu deveran nedihatîn bihîstin bêpar bimana...

Wê rojê, wê roja fîqspî, Êso bi mirina Meyrema Goze-lan pîrr êşîya. Kî bimraya li ser wan digiriya. Li pey mirina hemû kesî kezeba wî diperitî. Jixwe hema bêje herûher gi-lolîk ji çavan dibarîn. Piştî ku li ser Meyremê jî têr giriya di cî de bû gine gina wî.

“Hiçê sipîsax bila li ciyê xwe be û Meyrema weke gu-lêkê rabe bimre... De were nebeice!”

Dînîtî û kêmaqiliya Êso li aliyekê, lê birastî jî piştî bû zengilvan, xwe ji dilûcan da ser karê xwe. Piştî li ser Mey-remê têr hêsir barandin karê wî hate bîra wî û bi bazdan çû

dêrê, kendîrê zengil bi çengelekî ve heliqandî bû, wî jê kir û heta jê hat xwe da ser kendîr, zengil lê da. Dengê zengil bi dîng dongê pêl bi pêl li hemû kuçeyan belav dibû heta li ser berfa xêniyan kombûyî jî diket û olan dida. Ew jî tevî dengê zengil di ber xwe de mijûl dibû û digot:

“Xesû ma, bûk çû.”

“Xesû sax, bûk mir.”

“Ma di vê berf û baranê de ev îş bû te anî serê me! Ez dibêjim qey Xwedê jî xwe şaş kiriye!”

“Tobe, tobe, tobe...”

Hew dihate bîra Êso ku êdî ji zengilê bigere. Melayê mizgefta nêzîkî wan yê mizgefta Şêx Meter bi bêhnfirehî li benda rawestina Êso bû. Di ber xwe de bû “ya sebir sebra” melê û rabû derkete ser minara çarling a mizgefta kevin.

“Ellahûekber, Ellahûekber!...”

“Dîng-dong, dîng-dong!...”

“Ellahû!..”

“Dîng!...”

“Ekber...”

“Dong!..”

Nisredînê muezîn heta azan da, pozê wî ji serma bû weke balıcanêke sor û xwe ji minarê berda xwarê. Êso hê jî bi vê bejna xwe ya kinik xwe dirêji kendîrê zengil dikir, di vê navê de bi daketina muezîn şa dibû û pê re çend carên din jî li zengil dida. Dengê zengilê wî pêl bi pêl heta cihên herî dûr belav dibû û diçû li ser nermika guhên Ermeniyên ku ji serma soro moro bûbûn, dibû pirs û datanî.

“Kirivê Bedo! Êra xêr e di vê saetê de dengê zengil, çi qewimiye?”

“Xêra çi halê çi... Meyremê miriye.”

“Rebenê ji xwe re xelas bû... Êş mêşa wê nema...”

“Lê hê gelek ciwan bû.”

“Ev tişt guh nade ciwanî û pîrîtîyê.”

“Rast e.”

“Xwedê gunehên wê efû bike.”

“Amîn.”

Guhekî Dîkranê Hesinger li ser zengilê Êso, yê din jî li ser mişteriyê wî yê Kurd bû. Bi ser şagirtê xwe yê ku nixafê dikişand de xeydî.

“De bilez bikşîne, de!”

Li aliyê din jî hişê Dîkran çûbû ser zengil. Di nav dengê zirme zirma hesinê sincirî de ku hê nû ji ser tifikê danîbû û dikuta de difikirî ka çi qewimiye.

Tûmasê çêkerê yemeniyan gava dengê zengil î ne di wextê de bihîst gazî şagirtê ber destê xwe kir û gotê:

“Girbo! Baz de here dêrê binêre bê çima evê dînik wisa misêwa li zengil dide...”

Girbo jî jixwe li hêviya fersendeke wiha bû ku xwe biavêje kuçê bi hevalên xwe re bi kapê bileyize. Zûtûka pêşmalka çermî li ber xwe ji xwe kir û weke tîrekî dakete kuçê. Girbo piştî ku têra xwe bi hevalan re bi kapê leyîst û zora wan bir nû hate bîra wî, wê hostê wî ji ber ku dereng ma çi bîne serê wî. Gava vegeriya dikanê hoste bi ser de hîlbû:

“Ev du saet in tu li ku derê bûyî segbav!”

“Hoste, Meyremê miriye.”

Lê hostê wî ji zû ve sedemê lêdana zengilan ji Sagoyê Sefar, ji Samoyê Pûşîfiroş, ji Sikoyê karker; ji Donoyê Çavtewş û ji Hecî Nono bihîstibû.

Gava Êso dît ku muezîn Nisredîn ji minarê daket, bi kêfxweşiyeke serfirazî benê zengil bi çengel ve girêda û xwe avête derve. Berê xwe da wan taxên herî dûr da ku

kesên kerr ên dengê zengil neçûbû wan hayîdar bike. Bi rê de çi cara rastî Ermeniyekî dibû mesele her carê bi şikleki ji wan re digot:

“Meyrema Gozelan mir!”

“Wa Xalê Dikro!... Meyremê, bûka Hiçê çû rehmêtê.”

“Mamê Sako te bihîst? Meyroka delal miriye.”

Ûso bi bejna xwe ya kinik di nav berfê de digindirî, carna pêlava wî ji piyê wî diket û di berfê de asê dima, çêrek ne dima pê nedikir û di vê roja zivistanê de ji xwîdanê şilo pilo dibû heta digihîşt Taxa Filla.

Li Taxa Filla ya zemanekî bi navûdeng li dewsa yên ku bi koçê li çar aliyê dinyayê belav bûbûn vêga sê çar malbatên Ermeniyên mabûn. Hemû her yekê ji wan berê xwe dabûn welatekî xerîb. Tenê nav jê mabû: Taxa Filla.

Piştî Ûso, bi kêfxweşiya bicîanîna wezîfa xwe, ji hal û hewal ketî berê xwe dîsa da ser riya dêrê. Li malan û dikanan hemû kesî behsa Meyrê dikir.

“Weyla bedewê!”

“Rebenê!”

“Xwedê teksîrata wê efû bike!”

“Tobe tobe lê ne dora wê bû!”

“Heta pîr hebin meriv ciwana jî nabe!..”

“Heyfê, heyfê!”

“Çi çavne belek li ser bêbavê bûn.”

“Jixwe bejin û bala wê!”

“Tew ew çav û birû!”

“Lê ew meşa nazenîn.”

“Te dît di daweta de gava diket govendê?”

“Li pey xwe du zarokên sêwî hiştin.”

“Wê Hiçê wan xweyî ke...”

“Hiçê bi kêrî xwe nayê heta dora zarokan !...”

Mijûlahî û galegal heta Meyrê veşartin dom kirin. Dêr heta bi dev tije bûbû. Êso digot ji ber ku min baş li zengil xist evçend alem li hev civiya. Hema bêje hemû kes wê rojê hatibûn dêrê. Ji xeynî “Vanesê Qoqderizî.” Vanes yekî dîngelekî bû, ji ber wê yekê xelkê ev nav lê kiribû. Ji ker û hesp û hiştiran re kurtan didirûtin. Ji xeynî rojên yekşemê pêve tucar dikana xwe ranedida û miftê nedida destê şagirtê xwe nedîçû hewarî mewariyê. Jixwe kesî ji vê pê ve tu hêvî jê nedikir. Kesên ku nedizanîn çi karî dike û jê dipirsîn, bi pîrmekî mezin li wan vedigerand digot: “Ez terziyê kera me.” Ji kerekî ku vê bersivê bide tê çi kerftiyê bipêy.

Meyremê birin li ber serê keça wê veşartin. Keça wê ya ku şeş meh berê anî bû... Tevî hinek girî, bêhna bixûrê û diayên Keşe Arsen.

Roja pêşî ji bo xêrata Meyremê helawa tehîne û nan hate belavkirin. Gedeyên Kurda yê bêderpê matmayî li rî, cibe û xaça zîvîn ya di destê Keşe Arsen de dinihêrtin di berde jî nan û helawa ku dabûn wan dixwarin.

Meyrema Bedew piştî ku tevî axa reş bû, hemû kes ve-geriyan ser karê xwe. Eğûşê lastîkvan dîsa dest bi dirûtina çaroxan kir, Meroyê Hesinger faqên gura çêkir, Nişoyê Qop ê xerad ji darên hilûka bilûran çêkir, Henûşê Nalbend, nala kuta, bi kurtayî hemû kes dîsa bi karên xwe yê rojane ve daketin. Di vê navê de Êsivê Etar ê Keldanî, cîranê wî yê berber ê Suryanî Aqo listika damê domandin.

We şevê xew li du kesan tenê herimî. Yek jê mêrê Meyremê bû, Sikoyê hostê dîwaran, a din jî xesûya wê Hiçê bû. Hiçê ya pîrik ji kerbê ku bûk berî wê miribû dîmir. Digot qey ji rûyê wê ev yek qewimiye.

Siko gava kete nav nivînan kurê wî yê piçûk Seto û keça wî ya heşt salî Teko ji mêj ve di xew re çûbûn. Ew û

diya xwe Hiçê li bin roniya lembê ya kê m ji xwe re li rismê
Meyrê yê keçikaniyê ku bi dîwar ve bû dinihêrtin.

Li derve, li wan kuçên Diyarbekir yên teng, di wê şeva
zivistanê de gava Sarkîsê Ezîz riya xwe ya ji berfê spîtir
difirkand, Meyremê li nivînên xwe yên germ digeriya û
bêriya paşela mêrê xwe yê bi pirç dikir.

Kurê Mama

Li aliyê me wan deran, li diyarê me gava jinikek avis be, wî çaxî “ducanî” ye. Wisa be “bibar” e.

“Kevanî bibar e...”

“Êra we nebihîstiyê Hiçê ducanî ye?”

“Jinik îsal jî avîs e, helal be jê re!..”

Li aliyê me wan deran ji bo jinikek bi halekî bimîne, bihemle be, ne hewceyî bijîşk û dermana ye. Tevahiya jin û mêran hema ciyekî rayî bikin û keysê li hev bînin ev îş tamam e!.. Neh meh û deh roj bi şûn ve wê piştîyê xwe deynin. Jina ku salê carekê an ji du salan carekê zikê xwe newerimîne neyne ber pozê xwe an jî neh deh caran vî karî pêk neanibe bila jixwe re nebêje ez jî “jin” im! Ne wisa be ew jin ber nagre.

Li aliyê me gava jinek avis dimîne Kurê Mama pê zane bê çend rojî an çend mehî ye... Ne ji Kurê Mama be kî kare wan zarokan bîne dinê wê kî wan geda bikişîne derîne ji hûrê diya wan, kî wê bi meqesa ko û zengarî wan navikan bibirre û bêje:

“Wa Hiçê! Vê neqlê jî qîz e...”

“Xatûnê çavik rijiyayê, ev qîza çara ye te anî...”

“Xanimê çavê te bi ronî! Ê vê carê kurekî serzebeş e...”

Hûn zanin “birmotî” çi ye? Birmotî Kurê Mama bi xwe ye. Em, ango nifşê ku li Diyarbekirê li ber destê Kurê Mama çêbûne me bixwe pêşî Kurê Mama bi birmotiyê nas kiriye.

Kurê Mama hercar şûtikekî ji vanê şuxlê Kurdan li newqa xwe dipêça. Qutîka wê ya birmotiyê ya piçûçik a ji malê kevçiyar di nav wî şûtikî de bû. Wê hercar vê qutîka birmotiyê bi hezir ji ber xwe derxista, bi tiliya mezin û ya nîşandanê hêdîka ji ser de bigota tip tip lê bidaya û pişt re jî hêdî hêdî wê devê wê vekira. Wê bi herdû tiliyan ji toza zerpilokî ya nav qutikê piçekî hildaya, wê berê xwe bida kesên li dorê vehewiyayî bi awirne ji xwe qayil û bikêf wê pêşî destê xwe bibira ber firnîka rastê a pozê xwe yê mezin pişt re jî bibira ber a çepê û bikişanda. Toza ku li mûyên zerbûyî yên di qula pozê wê de ertilî mabûn cara duwem ku bi awayekî xurt hilma xwe dikişand tevde diçûn heta nav pişikê wê. Bê birmotî hedana Kurê Mama nedihat. Çawa ku xirîstiyaneke bê babtîz nebe Kurê Mama jî bê birmotî nedibû. Belê, Keşe Arsenê rîgijgij jî li ber xaç û Încîla pîroz û li ber Xwedayê ku li ezmana digere wê sond bixwara bigota ku şikra Kurê Mama gava çêbûye wê tevî birmotiya wê babtîz kirine û bi wî awayî xirîstiyaniya wê qebûl bûye.

Em, ango nifşê ber destê Kurê Mama di piçûkayiya xwe de gava em hê bê derpê digeriyan, me wê li ku derê bidîta, me yê bazdaya pêşiya wê û emê biçûna destê wê. Şîretên bavên me wek guharan bi guhê me ve bûn:

“Kengî gava te Kurê Mama dît tu herî destê wê maç bikî û deynî ser serê xwe.”